

Jimare  
**2**  
1985



Mîrkutên xwe bilind kin !

# MÎR KUT

KOVARA HER TIŞTÎ YE JI BO HER KEŞÎ YE

**ELVIS**  
Presley  
**KURD**  
**DERKET**



Jimare  
**2**  
1985




Mîrkutên xwe bilind kin !

# MÎR KUT

KOVARA HER TIŞTÎ YE JI BO HER KEŞÎ YE

**ELVIS**  
Presley  
**KURD**  
**DERKET**





**mîrkut** میر کوت

Kovara Kurdî a Mîzahî  
Humoristisk Kurdisk Tidning  
Journal Humoristique Kurde  
گوڤارێکی گالته و گهپی کوردی یه

خاوهن و بهرپرسیار:

مهحموود لهوهندی

*ansvarig utgivare  
och redaktör:*

Mahmûd LEWENDÎ

Adress.

c/o Ostberg  
Folkungag. 78 3<sup>tr</sup>  
116 30 Stockholm - Sweden

Prix: 10 SKr/10 FF/2 DM

ABONE:

ar/year/un an: 50 SKr/6\$

Tarîxa çapê: 1/10/1985

BO EW DU KESÊN KU

JI STOCKHOLM'Ê

BO ME NAME ŞANDIBÛN !

**J**i gotinên belaş rehetir  
û hêsantir tiştêk nîne. Bila  
ji we yek, di şûna me de ba  
û bila li vî welatê xerîbîyê  
birçî û tazî, bê mal û bê hal  
bê nan û savar, û teydîr, û  
carna jî nexweş biketa, û bi  
hata bikarîba ev kovar der-  
xista, wê wextê meyê bigota:  
"HELAL OLSIN BIRAKO! WELLE  
TU YÎ JÊHATÎ YÎ !"

MÎRKUT

**Ihiii..!**

Li gor muxabîrên me, hin belaşçî an bi gotineke din hin rûtan dest danîne ser Mîrkutên me! Em dizanin ew kî ne!

Her çi qas nîyeta wan xerab nebe jî, bi vî awayî ew mala Mîrkutê çortan dikin.

Ji ber ku li gor redaksiyona Mîrkutê ya ekonomîk, bêtirî ji % 60'ê kovarê ketine destê van belaşçî û rûtan.

Navê van belaşçî û rûtan derbasî arşîva îstîxbarata Mîrkutê bûye.

Mîrkut dil heye ku di hejmarên dahatû de lîsteya van kesan peyder pey çap bike!

Yê ku naxwaze navê wî di "lîsta reş" de derê, di vê zûka li xwe mukur were..!

Birayên Rût !

Mîrkut bi tu paktan ve, an bi tu dewletan ve girêdayî nîne. Sermiyanê wê seraser keda helal e.

Rûtino !

Kedxwirî kedxwirî ye. Çi dolarek, çi deh dolar çi jî milyon dolar.

Ji kerema xwe re hediye Mîrkutê pêre-pêre bidin. Û vê yekê jî zanibin ku Mîrkut heta sax be, ewê li dijî her şeklên kedxwirîyê mucadele bike.

Bi silavên me yên delal,

Bimre rûtîzm, bijî keda helal.!

**mîrkut**

## CEND GOTIN

Ew e, jîmare 2 jî derket.

Belê, derket! Jê hêsantir tiştêk nîne ku mirov bibêje "derket".

Belam, wê yekê, hun werin ji me bipirsîn, ku bi çi ha lî û di bin kîjan şertan de derdikeve.

Bi gotin û nivîsandinê nabe, ancax "kovarçî ji halê kovarçîya fam bike!". Yê ku nedîbe, nizane.

\*\*\*\*\*

Wekî hun jî dibînin, kalîteya vê jîmarê baştir bûye. Teb'en mesrefa wê jî !

Me dixwest ku em bi rengîn çap bikin, lê mesrefa wê gelek giran e. Yanê derdê me pere ye. Ew jî tune ye!

Ger xwendevan ji alî ekonomîyê de bikaribin alîkarî ya me bikin, wê wextê derxistina bi kalîteya herî baştî rîn aîdî me.

Alîkarî jî, ji dolarek ta nizam' çend dolar dibe.

\*\*\*\*\*

Ji der ve bo me gelek nivîs û karîkatur hatin. Lê me tenê cîh da nivîsên du kesan; Hesenê METÊ û KURDO.

Hevalên din divê li me biborin û bibexşînin. Me di xwest ku yên wan jî bête çapkirin, belam gelek jiwan pir siyasî û xav bûn. Hinek jî ne mîzahî bûn.

Jixwe me dîtina xwe di nameyên ku me ji wan re şandî de diyar kirîye.

\*\*\*\*\*

Di vê jîmarê de me rûpelên Soranî hinekî zêdetir kir.

Me dixwest em rûpelên Dimilî jî zêde bikin, lê ji derveyî pêkenînekê tu tiştêkî din î mîzahî bi dest me neket. Em hêvîdar in ta jîmare 3 emê bikaribin rûpelên Dimilî jî zêdetir bikin.

\*\*\*\*\*

**M**e di jimare 1 de gotibû ku îsal (1985) emê tenê 2 jimareyan derxin. Va ye me herdu jimareyên xwe jî derxistin.

1986'an de jî emê çar jimareyan derxin. Ji ber ku îmkanên me yên ekonomîk tuneye ku em ji mehê an, ji du mehan carê yekê derxin.

\*\*\*\*\*

**T**iştêkî din jî,

Em wan hevalan pîroz dikin ku ew jî bi navê ZENGIL kovareke mîzahî derdixin.

Em bi vê yekê gelek kêfxweş in. Em hêvîdarin serkevtî bin.

Bi silavên me yên ji dil û can,  
bimînin di xweşiyê de.

Berpirsiyarê Kovarê

## PÊKENINEK



## DIROZIN



Yekem:

-Lew bîre da çît dekird?

Duwm:

-30 sal lemew pêş seetekey bawkim kewte em bîrewe minîş emro derimhênayewe, ke çî zor çak îş deka!

Yekem:

-Înca ewe çi ye! Min bawkim xoy 30 sal lemew pêş kewte her em bîrewe, ke çî dermanhêna(me derxist) hêšta zindûwe !

Duwm:

-Ay, lew diroye!

Yekem:

-Diro niye! Bawkim le bîreke da seetekey bawkitî qurmîş dekird!!!

Me pênsed(500) name ji xwendevanên xwe girt.

Gelek sipas jibo xwediyê nameyan.

Ji van pênsed nameyan emê tenê duduyan(2) çap bikin.

Ji ber ku 499 name hema hema wek hev hatine nivîsîn. Tenê yek ji wan cihê hatiye

nivîsîn. Lê ew jî ne ku ji Mîrku<sup>t</sup>ê re hatibû şandin, ji hevalekî re hatibû, lê ji ber orîjînalîteya wê, em wê jî wekî nimûne çap dikin.

Nameya yekem ku ji nav499 nameyan hatiye hilbijartin e ev e:

## name

"Mîrku<sup>t</sup> gehîşte min, zor sipas. Bi rastî<sup>n</sup> hun karekî gelek baş dikin.

Ev yekem car e ku kovareke weha derdikeve. Ez we pîroz dikim.

Zor sipas ku hun jibo welat dixebitin.

Ciyê Mîrku<sup>t</sup>ê di xebata we latparêztîyê de bi rastî<sup>n</sup> ne ciyekî teng e.

Bi rastî<sup>n</sup> hun xebateke hêja dikin û xebata we hêja ye û hêjayîya xebata we giranbuhayîya wê hêjatir dike.

Her kurd pê dizane ku me ji mêj ve bêrtîya tişteki<sup>n</sup> weha dikir, axirê em gehîştin miradê xwe.

Ji kerema xwe re jimare 2 ji min re bişînin. Sipas.

Bi silavên min yê<sup>n</sup> germî<sup>n</sup>

Birayê We ... ..;  
STOCKHOLM.

**nameya duwem**

## bersiva me:

Zor sipas jibo ku tu jî welatparêz î.

Em te jî pîroz dikin.

Bi rastî<sup>n</sup> tu jî gelekî hêja yî. Û her weha hêjayîya te jî ji giranbuhayîya te xuya ye.

Lê, bavê mino, qurban, heyran, her du çavê mi, ez bi gorî, heyrana te... ma ji te tirê ev kovar bi ka yê derdikeve. Ma tu nizanî ku di sed sala bîstan de her tişt bi pera ye?

Ma tu zanî ku her Mîrku<sup>t</sup>êk bi çend dolarên Amerîka dibe mal.?

Eger tu ji kerema xwe re çend dolaran têxî nava sipas û silavan û ji me re bi rêkî, emê bêtir kêfxweş bin.

Em dolarî te dikin.

Bi dolarên me yê<sup>n</sup> germî<sup>n</sup>

MÎRKUT

"Bismîlla,

Bêrtîya ku dest bi mektûba xwe bikim, silavên xwedayê a lemî<sup>n</sup> li ser we be.

Têm çavê piçûkan, destê me zinan maç dikim. Hun çawa nin? Baş in? Îşella hun baş in. Ger hun li min bipirsin; hemd ol-sin şukur ji xwedê re ez başim hema bila sihheta we di cî de be, bo min bes e. Tek meraqa min hun in. Îşella hun jî baş in.

Eêê, çî dîkin, çî nakî? Çî hewadîs hene, jî min re binivî sin. Li vê derê hewadîs mewadîs muhîm tuneye, dunya sar e.

Merivên me giş çawan in? Kî zewicîye, kî mirîye, kî maye? Zadê tsal çawa ye, çêre çawa ye pez çawan in?

Ji kur-xalê xwe Evdo re pir pir silava dikim, tēm destê wî û tēm her du çavên kurê wî Elo. Birayê min Mihyeddîn çawa ye? Li wî, li jina wî, li bûrayê wî, bacanaxê wî û cîranê wan bol bol silava dikim.

Wekî din jî li merivê me gi şa, li yê ku ez nasdikim û nas nakim, li hemûya pirr pirr silava dikim.

Ê ku vê mektûbê dixwîne, ê ku guhdariya wê dike, li hemûya silava dikim.

Wekî din jî, ê ku min ji bî- ra kirîye navê wan binivîsim, li gişan silava dikim. Dîsa ê ku li min dipirsin û miraqa min dîkin li gişa silav dikim.

Beriya ku mektûba xwe biqê- dînim, careke din li we gişan yeko yeko silava dikim, tēm destê mezina, çavê piçûka ra- dimîsim.

Emanetê xwedê bin.

-tmze-

„Geneqqele“



Li Kurdistanê Iraqê yek hebû jê re digotin Beşîr Mişîr. Beşîr Mişîr piştî çil salan radibe jina xwe berdide. Jê dipirsin "bo çî?"

Dibêje:

-Kakecan, erê baş bû, belam erêb derçû!

ereb derçû





-Be amade kirdinê Kurtemuxbîrî  
MIRKUT her le baregey xot da-

# KIN KURT

## deng Ûbas

Paksî çû Amerîka.  
Li Almanya Federal beşê Enstîtuyê vebû.  
Mellê **ME...** bi AIDS'ê ket.  
K.M. Doktora xwe firot.  
Romana Ewko derket.  
Rêgan neket.  
Dolar ket.  
Seyda kuxya.  
Newroz îsal jî tê.  
PEN-KLUB li endamên nû digere.  
Berbang wê indî jî mehê carekê derkeve.  
Jiyan zehmet e li Afrîka Başûr.  
Melle: "E jî tijî bûme".  
Romana Ewko xelata NOBEL'ê ne**GIRT**.  
Li Swêdê hejmara zarokan zêde dibe.  
Çiko li Stockholmê hat girtin  
(du sal berê bi darekê de mistibû)

## Le Ciyatî Bawkî

Polîs:

-Temenit çend e?

Kurr :

-10 sal.

Polîs:

-Temenit 10 sal e w ke

çi dizî dekey?

Kurr :

-Be xwa min xom diz nîm,

belam bawkim nexoş e, minîş

be mûweqetî cêyî ewim girtotewe!



-I-

-Elo, rojbaş !  
-Rojbaaaş, rojbaş!  
-Xeberê nû çi hene?  
-Wele tişteke tune.  
-Li cem we çi heye?  
-Tişteke tune.  
-Ji welêt xebera te heye?  
-Wekî berê, tu jî zanî.  
-Li Tirkîyê çi heye?  
-Wele tişteki nû tune!  
-Li jêr?  
-Wele nîza'm!  
-Ortadoxî tevîhev e van rojan, haa..!  
-Immm...  
-Te dî Rêgan çi go?  
-Immm...  
-Eêê?  
-Wele xweşî !  
-....!  
-....!  
-Imm...  
-Imm...  
-....!  
-....!



-II-

-Elo, êvarbaş!  
-Êvarbaaaş, êvarbaş!  
-Çi heye çi tune?  
-Wele qet!  
-Çi dikî?  
-Qeet!  
-Wekî din çi dikî?  
-Wele qet!  
-Êêê looo?  
-Saxî!  
-Daha çi heye?  
-Qeet!  
-Wekî din?  
-Wele qet!  
-Êêê daha daha?  
-Wele saxî!  
-Çi dikî çi nakî?  
-Qeet!  
-Wekî din?  
-Wele qeee..!  
-Êêê de bêje looo?  
-Saxî!  
-Ê de şevbaş!  
-Şevbaş!



# KURDBUYINA ELVIS PRESLEY



ELVIS DI XORTANIYA XWE DE  
LI WELÊT..



ELVIS LI XERÎBÎYÊ (Amerîka)

**Z**imanzan, tarîxçî, fîlo-sosyolog Dr. Zikmak ÇILZIMAN di Kombûna Komcivîna Hemû zimanzanên Dinê de, li Parîsê dîtineke nuhpêşkêşî hemû zimanzanan kir. Û her weha ji alî me de jî rastiyeke derxist ro nahiye ku heta nuha nehatibû kifş kirin.

Dr. Zikmak ÇILZIMAN gava ku ev teoriya xwe (ku êdî hatiye îspat kirin) pêşkêşî zimanzanên dinê kir, hemûyên zimanzanan mit û mat mabûn. Dê vê hemûya niv mîtro jihev vebûn. Hela tewr, şiklê jihev vebûna devê hinekan gelek'ec cayîb xuya dikir.

Ji ber ku wan nedixwestin vê rastiye qebûl bikin. Bitay betî jî zimanzanên Amerîkayî li xwe heyirîbûn, şaş mabûn. Ji ber ku ev dîtina nuh, ango teoriya Fîlo-sosyolog Zikmak ÇILZIMAN, ji alî emperyalîstan ve heta nuka hatibû veşartin.

Wêneyek Fîlo-Sos Dr. Zikmak ÇILZIMAN (ev wêne li tu cîyekî nehatiye çapkirin, heta nuha di arşîva me de bû)



Fîlo-Sos Dr. ye me Zikmak ÇILZIMAN, Di Kombûna Komcivîna Hemû Zimanzanên Dinê de, li Parîsê, gava ku dîtina xwe ya tarîxî pêşkêşî civînê dikir.



Lê, Fîlo-sosyologê me ye jîr û qehreman xwe pê re gihand û ew ji bo me û her weha ji bo hemûyê Rojhilata navîn derxist ronahiye.

Belê, ev darbeyekî gelek mezin e, dê li emperyalîstên rastîxuran bikeve.

Zimanzan û Fîlo-sosyologên Amerîkayî ku ew jî beşdarî Kombûna Komcivîna Kongreya Hemû Zimanzanên Dinyê bûbûn, hinek ji wan ji salona kongrê derketin derve.

Derhalkê, telefon, teleks têlgiraf, FBI, CIA, MOSSAD, he mû ji xew şiyar kirin.

Çi bû ev ? Ango ev teorîya Fîlo-Sos. Dr. Zikmak ÇILZIMAN.

Belê, Fîl-Sos. Dr. Zikmak ÇILZIMAN di komcivînê de, bi dûr û dirêjahî li ser vê meselê sekinî. Emê gotinên Fîlo-Sos'ê me li vêderê, bikurtebirî pêşkêşî we xwendevanan bikin.

Gor dîtina Dr.'yê me, dengbêjê bi nav û deng, û menşûr Elvîs PRESLEY kurd e!



Elvîs



Bavê Elvîs, berîya ku surgûnî Şikagoyê kirin.



Li KERCEWSÊ taxa mala Elvîs

Belê, belê, hun çewt na-xwînin. Ev dîtineke rast e, û hemîşe ji alî Dr.'yê me, hatiye îspat kirin.

Belê, weha dibêje Dr. yê me:

"Eslê ELVÎS ji Kurdistana Turkiyê ye.

Li hêla Mêrdînê, li qeza KERCEWS (Kercos)ê hatiye dinê Navê bavê wî GENDO ye. Navê diya wî ETÊ ye.

Di wexta "mecbûrî îskanan de bavê Elvis ji Kercewsê surgûnî Şikagoyê kirine. Ew jî mecbûr maye bi bavê xwe re çuye Şikagoyê.

Wexta ku çûn Sîkago'yê, wê wextê ELVÎS hîna çardeh salî bû.

Gava ku Elvîs li Kercewsê bû, dergîstîyek wî jî hebû ku

navê wê HERLIBENDÊ bû. Lê mi-  
xabin gava ku Elvîs çû Şîka-  
go'yê, dergîstiya wî jî li  
Kercews'ê ma..

Elvîs li Şikago'yê, ji ber  
xerîbîyê û bi taybetîû xase-  
ten ji ber agirê evîna HERLI  
BENDÊ dest pê dike sitranan  
dibêje.

Sitranên wî bi carekê de  
li Amerîka û Awrûpayê belav  
dibin.

Amerîkayî, Awrûpayî hemû  
kes guhdariya sitranên wî di  
kin, lê tu kes bi navê wî nî  
zane.


Ji ber wê yekê jî, navê  
sitrana wî ya yekem li wî di  
kin.

Sitrana wî ya yekem ku li  
ser xerîbî û dergîstiya xwe  
gotibû weha ye:

*Ez li wî serî  
Tu l' wî serî  
Wer, wer, wer,  
                    dîlbera min,  
Wer, wer, wer,  
                    vî serî.*

"Ez li wî serî" ji bo meqamê  
sitranê hatiye kurt kirin û  
bûye "Elwîserî".

Di pê re ji ber ku Amerî-  
kayî tîpa "e" yê dadîqurtînin  
û "r" yê di esmanê devê xwede  
diloqînin û dicûn, tenê "EL  
wîs" maye. Yanê:



Elvîs li sahnê (Şikago)

Ez li wî serî

Ezliwîserî

Elwîserî

Elwîs

ELVIS



*Elvîs di hembêza bavê xwe de*

Hin kes hene ku dibêjin ; Elvîs'ê meîlhama xwe ji mûsî qîya reşikan wergirtiye. Belam be daxewe ne wilo ye. Wî îlhama xwe ji xerîbîyê û ji evîna xwe û Herlibendê girtî ye.

Gava ku Elvîsê ma li Kercewsê bû navê wî KÊRTO bû, lê wekî me got; di pê sitrana "Elwîserî" navê wî guherî bû ELVÎS.



*Elvîs (Kêrto)  
li ber golika*

Elvîs, yanê Kêrto'yê me pir ji dergîstiya xwe hez dikir. Heta van salên dawî jî, wî û Herlibendê, her tim ji hev re name dişandin.

Lê di pê mirina Elvîsê me re, Herlibendê jî çû xwe ji serê gotê çiyayê Metînan avêt gelîyekî kûr, întixarkir. Lewre di pê mirina Elvîs re deyaxa wê nemabû.»



*Herlibendê; aqirê  
dîlê Elvîs,  
evîna wî ya uekemîn  
û dawîn.*

Belê xwendevanên hêja. Ev e dîtina Dr. Zîmak ÇIL ZIMAN. Lê me tenê kurtebira wê ji we re nivîsî.

Di jimareya dahatû de emê bi dûr û dirêjahî li ser vê yekê bisekinin. Û her weha ji bo xatirê we emê roportajekê jî bi Dr. Zîmak ÇILZIMAN re bikin.

Elvîs an Kêrto'yê me li me pîroz be !

Muxbîrê MÎRKUT ji Parîs

**ay dayêêê !!!**

Ax  
 Bavo ax!!  
 Ay dayêêê!  
 Qîîîjjj  
 Qîîîjjj  
 Qîj !  
 Ay li min.  
 "Rebennoo!  
 Hêsîrnoo!  
 Sêwiyên bindest!  
 Qîrîna min bibîzin!"  
 Qîîîjjj !  
 Ay li min,  
 Heware  
 Loooo...!  
 Guh bidin  
 "Xwîn diherike  
                   ji kezeba min"  
 Xuşşş,  
           şirrr!  
 Çip,çip,çip !  
 Bi elbikan,  
 Bi satilan,  
 Bi beroşan  
 Xwîn dişirşire  
 Ji her alîyê min!  
 "Evdalno,  
 Hêsîrno,  
 Rebennoo..!"  
 Looo..!  
 Axx..!

HEMETER



*Dunya gulover e,  
 û ne çar goşe ye,  
 Ji ber ku ne çar goşe ye,  
 Mirov  
           wê  
           wextê  
 Dikare bibêje  
                   gulover e!*

HEMEPOTES-Uppsala/Swêd



JI PENCERA REXNEGİRAN



WEY LI MIN

BRAO !

Apê Leto

APÊ LETO JÎ HAT GIRTIN!

Xwedê bela cûnta faşîst bide!

Xwendevanino!

Hefta borî eskerên cûnta faşîst avêtin ser mala Apê LETO, ew û jina wî û her sê zarokên wî girtin, birin avêtin zîndanê.

Apê LETO û malbata wî nuka di bin îşkencê de ne. Apê LETO meqaleya xwe ya vê jimarê jî nivîsîbû, lê, cûnta bêûjdan û kezebreş meqaleya wî jî bir.

Wey tu bibelqitî cûnta faşîst!

MÎRKUÛ

PÊKENÛNEK

Teralek pişta wî dixwire,  
lê ji tembelî nikare pişta  
xwe bixwirîne, hundurê destê  
xwe dixurîne û davêje paş xwe..!



Bijî hebûnîzm

Bimre rûtîzm !



rûtek

HAHOO! HAHO!!!

THOMAS BOIS

herausgegeben von  
YEKTA GEYLANÎ

# KURDISCHE VOLKSDICHTUNG

## Spiegel der kurdischen Seele

Mit einer Einleitung von Joyce Blau

Mit einem Vorwort von Günther Deschner

**Kurdisches Institut**

*Meinem alten Freund  
Jean Bertolino*

← Rûpelê duwem

↑  
Qapax

Li jor hun qapaxa kitêba THOMAS BOIS dibînin.

Ji derveyî navê nivîskar, navê çar kesên din jî li ser qapaxê heye.

De ka hun werin bibêjin xwendevanino! Ma mirov wisa dike? Mirov gava ku kitabekê çap dike, qe nebe divê mirov navê 15-20 kesan li ser qapaxê binivîse; navê bavê xwe, kalikê xwe, heval û hogirê xwe .....

# .....EV WEHA YE,

**ÇAWA**

**QOYMİŞKIRINE**

**BILA WISA JÎ**

**ÇIQARMİŞ BIKIN!**

Reşo	TURAN
Hemze	TURANOĞLU
Ferho	ÖZTÜRK
Hemo	TÜRKEKUL
İso	BOZKURT
Evdö	CENGİZOĞLU
Mîro	KUTLUAY
Seydo	ALPER
Hewê	ÖTÜKEN
Sêvê	KAĞAN
Rindê	HASTÜRK
Kewê	TÜRKOĞLU
Binevş	BİLGEKAĞAN
Zerê	ASİLTÜRK
Bişar	TÜRKKAN
Keskê	TÜRKEŞ
Xatun	ALPASLAN
Şemo	ERTUĞRUL
Qenco	SOYLUTÜRK

Em li jêr, ji oxiyicîyên xwe re çend nav û soyadîyên gelek orîjînal sermişî ber çawa dikin. Helbet lîsta ku me yazmiş kirîye û dîzmişî jorê kiriye ji nav hezaran nav û soyadîyên weha yanlîz kesimekî oliştirmiş dike.

Hun hiç düşünmüş bûne ku degiştirmişkirina soyadîyan qolay nîne. Helem di surecekî weha de û di qoşilên îro de.

Meriv dikare navên nû, qoymişî zaroyên nûdoxmîşkirî bike. Lê, olanaxa qoymişkirina soyadîyên nû hemen hemen hiç tune ye.

Yanlîzce, perê meriv hebise, û tanidixên meriv yaxut jî torpîla meriv hebise meriv dikare bi mahkeme yo lîyê dawe açmişke.

Aslînde ji sahibên van soyadîyan re cîgera meriva yanmiş dibe. Feqet, çi yazix kî artix Mîrkut bîlem nî kare van zewallîleran qûrtarmişke !

Ew kes van soyadîyan çawa qoymiş kirine, bila wisa jî çiqarmîşkin!

# LÊ WEHA ÇAWA YE ?

**BİR YANDAN**

**KENİYOR**

**DİĞER YANDAN**

**HÊRSİYOR MUSUNUZ ?**

Tülay	ZINAR
Tanju	ÇIYA
Ayça	POLA
Sevim	TEMO
Okay	JIRKÎ
Alper	BERZANÎ
Tuncay	ROHELAT
Tunç	BÊRTÎ
Evren	SÎPAN
Deniz	PILING
Türkan	BRÛSK
Kutlan	XELAT
Dolunay	ZÊRÎN
Çıgdem	ŞÎRVAN
Gökçe	ÇETO
Güngör	LEPZÊRÎN
Tuncel	KURDO
Bariş	MÊRXAS
Erol	BERZENCÎ

Biz fikîrîyorûz kî siz şîmdî bîr yandan kenîyorsûnûz dige yandan da hêrsiyorsûnûz. Lê, hêrsemenîze hiç bîr sedem yoktûr.

Biz bûrada ne Türk hakiyla tinaziyorûz, ne jî Türk ad lariyla qerfîyorûz.

Bîr gerçegî bazen onûn ziddiyla daha iyî famiyor olmamiz, bîzî böyle bîr örneğî nivîsîyor olmaya tamiyor.


Yan na, Türklere cebren kürt soyadlarini koymayi fî-kîrmiyorûz ve onların ad ve soyadlarına da kenmîyoruz, ve de kenmeyeceğiz.

"Tülay TEMO" gîbî bîr îsmî xwendîyor oldûğûmûzda "Kewê ASÎLTÜRK" gîbî bîr îsmîn sosretlîğîni daha iyî famiyor, daha iyî hîniyor, daha iyî lêvarqîliyorûz.

Hêviyorûz kî okurvanlarımız bîzî çewt teneğihîyorlar. Aslında burada têgihîyemeyecek bîr şey yoktûr.

Bîzî biboriniz, bûnû mecbûren türkçe nivîsîyorûz.

MÎRKUT



Bi  
Nivîskar  
-Rojnamevan-  
Dengbêj  
Mîm GALAKSÎ  
Re

MÎRKUT-Ez benî, zatê te di çi katî de û li kudera Kurdistanê ji dayik bû?

GALAKSÎ-Bîyografîyâ min bixwîne !

MÎRKUT-Ez benî zatê we dikare piçek qala malbata xwe bike ?

GALAKSÎ-Diya min ji mala Mîrên Hekkarîyê ye, bavê min jî ji mala Begzadên Hewlêrê ye. Bapîrên min di dema dewleta 'Us manî de li Diyarbekirê li taxa mala Cemîlzadeyan bi cîh bûn.

MÎRKUT-Mîrê min nivîskariya we kengî û bi çi awayî destpêkir?

GALAKSÎ-Ez di du saliya xwe de fêrî xwendin û nivîsandinê bûm. Di dû re, heta çar saliya xwe min ji kovar û rojnameyên cûr-be-cûr re helbest û gotarên deribandî û ceribandî nivîsand.

MÎRKUT-Begê min, lê pirtûka we ya yekemîn ?

GALAKSÎ-Berî vê yekê dixwazim bidim diyar kirin ku di esasê xwe de bavê min dixwest ku ez bibim xerrat. Lê yê min, meraqa min her li ser sin'et û edebiyata bilind bû.

MÎRKUT-Begzadê min, pirtûka we ya yekemîn?

GALAKSÎ-Bi rastî pirtûka minî yekemîn ji aliyê hevalemî ve hati-bû nivîsandin. Ji ber çewtîyeke teknîkî navê heval ji ser qapax şemitîbû. Dîsa ji ber çewtîyeke teknîkî û ji bêpîrîya hin zikreşan, navê min herikîbû ser qapaxê û pê ve helyabû.

MÎRKUT-Yanî ew pirtûk ne ya zatê we ye?

GALAKSÎ-Him erê, him na! Ev yeka girêdayî ku mirov çawa meselê dibîne. Êdî her kes û ûjdanê xwe!

MÎRKUT-Çawa yanî ?

GALAKSÎ-Çîroka vê meselê dirêj e bi rastî. Jixwe ev komplekî bû li dijî min.


MÎRKUT-Çawa yanî ?  
 GALAKSÎ-Ez niha naxwazim navê wan xêrnexwazên ku li dijî min vê  
 komployê çêkirin bidim der. Ji ber ku hê zû ye!  
 MÎRKUT-Cawa yanî ?  
 GALAKSÎ-Eger hun ji min bawer nakin, ji her sê birên min û zavê  
 me bipirsin.  
 MÎRKUT-Çawa yanî ?  
 GALAKSÎ-Welleh, bi serê bavê te ez bê gune me !  
 MÎRKUT-Çawa yanî ?  
 GALAKSÎ-Ne min di serî de jî got ku ev komploya hindilnexwaza ye.  
 MÎRKUT-Çawa yanî ?  
 GALAKSÎ-Em kurd nikarin hevûdu bikşînin. Dilê me naxwaze ku bira-  
 kî me yî kurd pêşkeve, û li dunyayê, bi taybetî jîli Awrû-  
 payê nav û dengê xwe belav bike !  
 MÎRKUT-Em dikarin werin ser pirtûkê?  
 GALAKSÎ-Ez îro nivîskar û rojnamevanekî naskirî me. Te got Kurd;  
 ez tîm bîra hemû cîhanê, lewre hin zikreş min nakşînin.  
 MÎRKUT-Waaa ?  
 GALAKSÎ-Welleh !  
 MÎRKUT-Êêê..?  
 GALAKSÎ-Tu çi vedixwî ? Wîskî, Şeraba sor, Şampanya, Konyak ?  
 MÎRKUT-Tasek ava sar, sipas. Em werin ser pirtûkê!  
 GALAKSÎ-Tu weha bikî ez careke din bi te re roportajê nakim !  
 MÎRKUT-Çima ?  
 GALAKSÎ-Mal ava, ez ji serê siba xwedê de ye ji te re dibêjim,  
 nizam ku tu ji min bawer nakî? Tu naxwazî bawer bikî ?  
 Tu ji min fam nakî ? An na, tu ji xwe bê fam î ?  
 MÎRKUT-Em dikarin werin ser pirtûkê ?  
 GALAKSÎ-Rica dikim!!! Binêre...!!!  
 MÎRKUT-E' jî rica dikim!!! Lê pirtûk !?  
 GALAKSÎ-La hewle welaaa...!! Binêre...! Ezê...!!  
 MÎRKUT-Ê bî xatirê te, gelek sipas!  
 GALAKSÎ-!.....

Los ANGELES

1/10/1985

Muxbîrê MÎRKUT ji Amerika

Mirî gotiye, li ba me gotiye




servîsa  
kefen, tabût,  
telqîn, yasîn




û hemû karên dunya wî alî

tên kirin!

- \*Kevirên goristanê tê nivîsandin.
- \*Yasîn li ser mirîyên we tê xwendin.
- \*Bedêlheca we tê kirin.
- \*Mara we tê birrîn.
- \*Mirîyên we tê şuştin.
- \*Telqîna mirîyan tê xwendin
- \*Li gor her termî tabût hene
- \*Kefenê we tê birrîn.



Paqij  
\*  
erzan  
\*  
BILEZ



Anonîm Şîrketiya  
Minkir-Nekir Oxillerîyan

Edres: Weqif Xan, No: 99/z  
Telf.: 033 033 033-99  
Dêrê Mêrdînê-DIYARBEKİR



# DUBLAJ ANILARI

...larını yeniden yazardım.  
— *Değişiklikler yapıyor muydunuz?*  
— Tabii değiştiriyordum. Nitekim bazen Türk aleyhtarı filmler olurdu, onu Türk lehine çeviriyordum.  
— *Anınsadığınız filmler var mı hiç?*  
— Tabii var. Olmaz olur mu hiç. Örneğin o sıralar “Çanlar Kimin İçin Çalışıyor” diye bir film gelmişti, anımsıyorum, komünist propagandasıydı. Onu değiştirmek gerekti. Ben tamamen konuyu değiştirdim. Yani komünistlik propagandasını bertaraf ettik. O zamanlar çok sıkıydı ortalık. Bir film gelmişti. Bulgar filmiydi anımsadığım kadarıyla, “*kahrolsun Türkler*” diye bağırılıyordu içinde, biz onu “*yaşasın Türkler*” yaptık.  
— *Peki konu değişmiyor muydu bu şekilde?*  
— Eh işte değiştirmemeye çalışıyorduk. O bizim deneyimimize giren bir şeydi. Yılların verdiği bir deneyle onu yapabiliyorduk.



Sacide KESKİN

VIDEOSİNEMA

AYLIK DERGI

SAYI: 11 / MAYIS 1985

sf: 83

TIRK DIBÊJIN "Yorum yok",  
YANÊ KÎ DENGÊ XWE BIKE G U R Û G U P !

Mamoste ji teleba xwe ya keçik dipirse:

BO ÇI ?

-Bo çi dereng mayî ?

Keçik:

-Mamosta, gava ku ez dihatim mektebê lawikek li pê min bû, her bela xwe di min dida, ji ber wê ez hinekî dereng mam.

Mamoste:

- Ê, te çima 'ecele nekir?

Keçik:

- Lê lawik hêdî dimeşya !



BELSEM



## JI UNIVERSÎTEYA KOŞKAROLOJÎ

Tekstek li ser kevirê reş ê Qerejdaxê hatiye dîtin. Em nizanin ev tekst bi devoka ku derê - kîjan bajarî, kîjan gundî- hatiye nivîsîn. Ger xwendevanên me yê ezîz û delal-ku em nadin bi barekî şekal-pê dizanin, ji kerema xwe re li ser navnişana jêrîn bi rêkin.

Tekst ev e: (hin cî jê nehatiye xwendin)



### NAVNIŞAN:

Unîversîteya Koşkarolojî

Fakulta Mizmarolojî-Mîxolojî

Beşê Erdkolojîyê

Beqqal Hemcûn Qerejdax Eliyle

Çarşiya Şewitî-Mazot Qarşisinde

Numro: 1

DIYARBEKIR




## anonsek îllegal

BÛRSA KU ENSTÎTUYÊ DAYE MIN  
BI ERZANÎ DIFROŞIM. KÎ DIXWA-  
ZE BIKIRE ? MIN TENÊ SALEKÊ  
BI KAR ANIYE, HÎN ÇAR SALÊN  
DIN MAYE.

PARÎS  
Telf:001 0101

Bûrsqîyek





## çend peyvikên nû

Fîlolog Dr. .

Zimandirêj DEVJIHEVE

Erdkolojî : Arkeolojî

Erdkolog (1): Arkeolog

Muxtar : President de la republique

Melle : Wezîrê karûbarê dîyanetê

(1): Di raneya ARKEOLOG û ARKEOLOJÎ de, hin kes hene peyvên ZENGAROLOG û ZENGAROLOJÎ bikar tînin? Di eslê xwe de ev xelet e. Ji ber ku Zengarolojî beşekê Erdkolojîyê ye, divê bête zanîn.

### MÊRDEY MEYMÛNE

Piyawêk jinêkî dewlemend dehênê.

Rojekyan mêrdekey lê depirsê:

-Erê le malî bawkit be çî ratdebiward ?

Jin:

-Be meymûnekeman!

Mêrd:

-Ke wate ba minîş meymûnekit bo bikirim?

Jin:

-Na, to xoş bî, meymûnim nawê!!!



### anonsêk

ÊWE KA W WÛNCETAN DEWÊ?

HER CORE KAYEKMAN HEYE.

ERZAN Û XAWÛN !

Bo ew jimarey telefonê biken:

Telf:9999-99+1

GARE DE LYON-Paris

türkiye, jibo rastkirina  
ekonomiya xwe, li hin  
qareyên nû digere!



bijî evîna aza

bimre qelen



bêkarek

# FAL

Bi Hazirkirina  
Stêrolog Necmeddîn el Munecçîm

BERAN 21.3/20.4	Karê te baş diçe, qet dengê xwe meke, piştî şeş mehan ew problema te jî hel dibe. Gramatik baş e, pîraktik kê m e. Ewê jî bibe, hêvîya xwe ji xwedê mebi re, xwedê pir mezine.
BOXE 21.4/20.5	Rebeno, perîşano, belengazo, lawo ma bes e, te xwe kuşt, derkeve tahtîlê.
CÊWÎ 21.5/21.6	Bextê te reş e, ma tu çima deh sal berê nehat dinyê. Bîlleheq neçe qursê, perê te bedihewa diçe ehlîyetê nadin te.
KEVJAL 22.6/23.7	Kêf kêfa te ye, ma tu êdî çi dixwazî?
ŞÊR 24.7/23.8	Kare te baş e, divê ku tu ji malê re hinek pere bişîni yan na diya te şîrê xwe li te helal nake Ji alî evîne de jî qismetê te vekirîye, dewamke.
SIMIL 24.8/22.9	Qet lê negere, heta nuha kest binê nedîye. Hinekî romantîk be. Bê kravate (cravate) megere.
MÊZÂN 23.9/22.10	Here kêleka behrê, li wê derê helbestan binivîse, nivîsandina li kêleka behrê ji qopyekirinê çêtir e.
DÛPIŞK 23.10/22.11	Zêde neçe qahwê, heftê carek bes e.

KEVAN 23.11/21.12	Bi zorê nabe, cezê wê gelek e. Ger tu bawer nakt ji Pakstiyekî bipirse.
KARİK 22.12/20.1	Ero ma meh nemabûn ku tu di vê meha çilê de hatî ye dinê. Xwedê zane te nuka çiqas serma xwarîye.
SATIL 21.1/19.2	Rojekê pêş de ji xwe re karekî bibîne, 'eybe, ji AMS'ê jî nereve.
MASÎ 20.2/20.3	Tu çî dixwazî bavê mino? Ma qey ez falçî me ? Ma ez çî zanîm ewê çî bi serê te de were!

ROPORTAJ  
BI XWENDEVANAN RE  
Ji Me Pirs, Ji We Bersiv

- Gelo hun du nivîskarên kurd dinasin ku li hev bikin û li ba hev rûnin?
- Kovara Enstîtuya Kurd; Hêvî salê du(2) jimareyên wê derdikeve, geloçend jimareyên wê derketine?
- Gelo kovarek kurdî heye ku di wextê de derdikeve?
- Nufûsa me kurdan çiqas e?(ji ber xwe ve navêjin)
- Gelo rêxistinek kurda heye ku kongreya xwe di wextê de çêkiribe?
- Gelo li Swêdê kurdek heye ku ne nivîskar be?

**ME TIŞTEK BIHÎST,  
GELO  
RAST E?**

Tê gotin ku li bajarê Uppsala  
layê çend kes peyde bûne ku jî  
xwe rê dibêjin MÎRKUTÇÎ!

Sekreterê Giştî yê MÎRKUT



# ANONS

di vê rûpelê de  
DEMOKRASÎ heye  
SANSUR tuneye

-kî çi bixwaze dikare bibêje-




KELEŞKOFA  
XWE  
TEVÎ  
REXTÊ WÊ  
DIFROŞIM

Bêrût/Lubnan

LI BAVÊ XWE DIGERIM!

Çar sal berê got"di  
şim Almanayê", çû û  
nehat. Wêneyê wî ev e,  
Xêra bavê xwe ger we



dît, te  
lefonî vê  
numrê bikin  
44 44 44  
Lawê wî-Hezro

Dixwazim  
likaneke  
ettariyê  
vekim. Li  
ortaxekî  
digerim.

Kopenhag  
DANMARK

Bûrsa  
xwe  
difroşim  
PARIS



Emrê min 48 e. Xaniyê min û  
dikana min û tirimbêla min heye.

Li gor hevalên min ez jî ji  
xweşikên tîm hesabandin.

Kî min distîne ? Êrsiv bi foto..!

"Ji bo Xwedê" Almanya

MALA XWE DIFROŞIM  
KÎ DIKIRE?

"Muxtar"

Li "taban"ê  
xwe digerim.  
SEROKEK

Pisîka min van ro  
jana pir siqilmîş  
dibe.

Ez jî bo wê li  
psîkologekî dige-  
rim. "Psîk-Olog"

EM  
LI  
SEROKEKÎ  
DIGERIN!  
"taban"

Qursa devê xwe XWAROVIÇKO  
kirinê, ji bo kesên ku  
dixwazin Ingilîzî



fêr bibin.  
Telf/6380  
Sêwrea

KÎ  
PASAPORTA  
XWE  
DIFROŞE?

Şam/Sûriye



Dixwazim  
tahtîla  
Xwe ya îsal  
li Şikagoyê  
derbaskim.  
Kî bi min re  
re tê?  
"Li Amerîka  
her tişt heye  
Sydney/  
Australya

Ez li hevlekî an li  
hevlekê ku karibe her  
Yekşembe di riav seet :

18.55-19.55 de bi min  
re golf bilîze digerin  
Yê an jî ya ku dixwaze  
bila ji rimûza min î jê  
rîn re binivîse.

"Jiyan bê golf nabe"

Tensta/Swêd

Ez li tercumanekî di  
gerim.

Roja duşemîyê seet  
di 9'an de li mala  
Apo gorîşma min  
heye.

Kopenhag/Danmark

Ez ji maleke xizan  
im. Ev cara heştan e  
ku dikevim îmtiha-  
na unîversîtê, lê bi  
ser nakevim. Ne de  
bançe û ne jî perê  
min heye. Kî dixwaze  
di şuna min de  
tekeve îmtihanê?

"Welatparêz-Şirnaq"



Bûzdolabîya xwe bi  
400 Kronî difroşim;  
Tel: 081 Stockholm

Ez dixwazim romanekê  
binivîsim, lê xwendin  
û nivîsandina min tu  
neye. Li pênuşgirekî  
digerim. Em meaş da-  
wiyê dipeyivin.



"NOBEL-1999" Berlîna Jêrîn

Bavê min hê ez şeş salî bûm  
di trafîq qezasîyê da mir.  
Di dû pênc salan re diya min  
mêr kir. Ez û her du birayên  
xwe li ortê man. Niha emrê  
min 35 e. Tu warê min û ka-  
rê min nîne. Ez dixwazim we-  
rim Swêdê. Yekî kariba xêra  
xwe rê bi ber min xista he-  
ta saxbûma minê qencîya wî  
ji bîr nekira.



Ji hêla Cilîna

Feqî Mihyeddîn



## NAMEYA MIROVÊ GUNDÎ

Hevalê Sekretêr Ebû Sufyan Xoş deng!

Bi dilekî şikestî ez xwe ji partiya Demokrata Sosyalîsta Gelêrî a Cep a Kurdên Sûriyê paşve dikênim.

**"EZÊ**

**DÎSA**

**BIBIM**

**ËNDAMÊ**

**EŞÎRA**

**XWE"**

Sedem:hejmara partiyên kurdên Sûriyê gihîşt hevde partî û nîvan Li Kurdistana Tirkî bo 10-12 milyon kurd tenê 39,3 partî hene. Ango dema hejmara me li Sûriyê jî bigihê 10 milyonan wê hejmara partiyên me li Sûriyê bigihên 175 partîyan. Ev ji xencê kurdên ku dibin endamên partiyên şoreşgêr, "sewrewî" û "devrîmcî" yên ne teweyên din yên ku bo azadiya mirovan têdikoşin.

Li gundê me neh mal hene. Di wan neh malan de endam û sêpatî zanên 4 partiyên kurdên Sûriyê, 3 partiyên Kurdistana Iraqê, partî yek Kurdistana Îranê, 2 partiyên Kurdistana Tirkî, 2 partiyên Ereb, û 3 partiyên navnetewî yên "sewrewî" hene.

### Kurdo

Gundiyek kurd nameyek ji sekreterê Partiya Demokrata Sosyalîsta Gelêrî a Cep a Kurdên Sûriyê re şand.

Endamekî partiyeke din,, (Partiya Gelêrî a Cepên Demokratên Sosyalîstên Pêşverû a Kurdên Sûriyê) ev name bi xasûkî kir destên xwe, ko pî kir û li nav xortên zana da belav kirin, bo ew "anti-propaganda" li dijî dijminên xwe, endamên partiya din bike.

Di milê din de hemû kovarokên partiyên me, kurdên Sûriyê, dixwazin cîhanê ji empiryalîzm, kapitalîzm, sîyonîzm, pasverûnîzm, kevneperestîzm, û bûrjûwatîzmê rizgar kin. Dema ku li hin gundên Kurdistana Sûriyê hinek bo keran hev û du dikujin; endamên eşîran bi mîtralyoz û keleşkofan êrişî ser hev dikin û dû re tevî mîtralyoz û keleşkofên xwe ji ber du(2) cendirman direvin.

Dema ku hîn qîz û keçên me di  
rojên îroj de tîn firotin û bi  
hezaran xort nikanin ji derdê  
tunebûna peran bizewicin,.....  
Wisa min biryar da ku ez ji îroj  
û şûn ve dîsa bibim endamê eşîra  
xwe. Belkî ez bikanibim tew hin-  
dik endamên malbata xwe ji neza-  
nî û kevneperestiyê xelas kim.

Dû re dema ku wext li cem min  
vala ma ezê werim tev we cîhanê  
hemû ji empiryalîzm û kapîtalîzm,  
û sîyonîzm û hwd. azad kim.

Feylesofekî me yî bi navûdeng  
ber 3-4 sed sal gotiye:

BERÊ XWE AZAD KE, DÛ RE JINA  
XWE, DÛ RE ENDAMÊN MALBATA XWE,  
DÛ RE ENDAMÊN MALBATA CÎRANÊ XWE  
DÛ RE ENDAMÊN GUNDÊ XWE, DÛ RE TU  
Û ENDAMÊN GUND HERIN ENDAMÊN  
GUNDEKÎ DIN AZAD BIKIN, DEMA HUN  
LI SER ERDÊ WELATÊ XWE AZAD Û  
RIZGAR BÛN Û ZIKÊ WE JÎ TÊR BÛ,  
WÊ GAVÊ HERIN WELATEK DIN AZAD  
BIKIN.

Tev silavên germ.

Mîstefa Mihemmed Ahmed



## ŞI'IR DADINÎŞIM

Rojbaş  
Xoşewîstekem!  
Ruhekem,  
Canekem,  
Dermanî zamekanim!  
Meymûnekem,  
**Berxekem**  
Kemtîyarekem,  
Le pênavî to da  
Şikawe ejnokem!  
Petyarekem,  
Hestyarekem,  
Her dem  
Wekû mirwarî  
Şew û roj  
Roj û şew  
Şi'ir dadinîşim !

DIMBIKÇÎ-Xaniqîn



**DERDÊ XWE  
JI DOKTORÊ XWE RE BIBÊJE !**

**Dr. Bijisk**

*Dîktorê me nexweş ketiye ( gurrî buye ) û nuka di Nimîne Xestexanestîya Diyarbekirê de radizê. Ji ber wê yekê bi daxewe rûpelê tixtorê me vê hejmarê vala dimîne. Û her weha bersiva nameyên ku nexweşan ji tixtor re şandibûn jî, ji mecbûrî ewê bîmînin heta jimareyeka din. Heta jimare sê(3) ger tixtorê me sax bû, ewê bersiva wan bi de.*

*Bîbexştînin.*

*Du'a bikin ku tixtor sax be!*

MÎRKUT

**min jî nedîye !**

Padîşahêk ji wezîrê xwe re dibêje:

-Divê ku tu heta sibê ji min re gotinek welê bibêjî ku bila bi pênc perê qul neke...!

Wezîr diçe. Wê şevê xew bi çavan nakeve. Her çendî difikire, lê zor e, çawa bike ku gotineke bi pênc perê qul neke bibîne...

Wezîr serê sibê tê cem padîşah û jê re dibêje:

-Padîşahê min te bajarê Şamê dîtîye?


Padîşah:

-Na

Wezîr:

-Wele min jî nedîye!!!





Bav ji alîkî de,  
keç ji alîkî de

# ku meriv bixwaze

Hesenê METÊ

Merivekî, ji hêla jina xwe de gelek dîlxirçik hebû. Nedi-xwest û nedihîşt jina wî di nava gund de bimeşe û biçe nav malan, bigere.

Cara ku jinikê bigota: " Ev tişta ji min re pêwîst e, û ez dikim biçim mala cîrana peyda bikim." Mêrikê berî jinikê biçûya di mala cîrana de rûniştâ û piştî ku jina wî bihata, ji wan cîrana ew tişta bistenda wê hîna mêrik ji wir rabuya û biçuya.

Ku jinik biçuya bîrê an ka-nîyekê, wê mêrik hêdî hêdî li pê biçûya, heta ku jinik ji avê dizivirî.

Wexta razanê mêrik xwe dida hêla derê hewşê û radizyan. Lê tew xwedê nekira mêvanekî wîyî mêr an xort bihata..! Wê rojê ta çuyina mîvên, ji gurrpînên dil, ji mêzekirinên bi bal, û ji aswasên sêrî, di xwîdana mirinê de dima, gav lê dibûn sal.

Rindbûna jinikê meriv niza ne çawa ye, lê jinik bi xwe jî fam nake ku mêrê wê çima wisa ye, an weha dike. Piştî demekî ev livên mêrik, jinikê gelek nerihet dike. Jinik êdî baş fam dike ku mêrê wê nobedariya wê dike.

Rojekê lihevrûniştî ne, jinik jêre dibêje: " Mêrik ev rewşa te gelek xerîb e. Haya min ji te heye. Lê ew tiştên ku tu difikirî, li dora min tune ye û divê tu vîya jî, ji min nepê." Li van gotinên wê guhdarî dike lê, mêrik dîsa bi ya xwe dike.

Roj derbas dibin, meh tên û diçin, lê ev xwîyê mêrik nayêt guhertin. Jinik dinihêre ku nobedariya mêrê wê, li wê, hîştî pir tir û bi rewşek xerabtir dibe. Wisa dibe ku êdî jinik jî, ji xwe ditirse. Bi çavekî din êdî li dora xwe dinihêre, bi xwe jî, xwe mîna mirîşkek qûnde dibîne.

Ji van livên mêrê xwe pir û pir nerihet dibe. Di qehr û êşek tîr de diqepije.

Rojekê ji mêrê xwe re dibêje:

-Lawo..! tu were parîkî hişê xwe bide serê xwe, êdî ez wisa bûme ku li hemberê van livên te, ez jî ji xwe şik dikim. Tu dizanî ku ez tiştên wisa nafikirim. Lê, vê yekê jî bizanibe ku ez bixwazim, tu bi du nobedaren mîna xwe jî nikarî bi min re baş bikî û tew tu yê pê jî nehêsî.!

Mêrik bi fikrên xerab û bi hinek şiklan dîsa hay li jina xwe dibe. Naxwaze ku tu çavên mêr an kortekî li jina wî bike ve. Lê ya rastîn jî, jinik bi xwe jî ji wan tiştan dûr e. Lê carekê baş dide dilê jinikê. Li ser vê yekê jinik bi şiklekî ban kortekî dike û dixwe axo (axur)...

Di dû re testa xweya hevîr tîne datîne, arvan rodikî yê û avê ber dide ser û distirê. Bi qasî qederekî destên xwe yên bi hevîr ji xwe dûr digre û banî mêrê xwe dike, dibêje:

-Lawo...! ca were mîza min di bin min de çû.

Mêrik bilez û bez xwe digihî ne cem. Jinik zû-zûka dibêje:

- Ca vê doxîna min veke, ez biçim axo (axur).

Mêrê wê doxîna wê vedike, de linga wê jê dişeqitîne xwarê. Jinik diçe heta ber derê axo, û li wir dîsa ban mêrê xwe dike:

- Ero were ji min re derî jî veke, ma tu nizanî ku destên min bi hevîr e?

Mêrê wê tê destê xwe davêje çengalê derê axo, derî vedike û jinikê berdide axo.....

Bila jinik mirazê ku di axo de bîne cî, lê mêrê wê?..

## PÊKENÎNEK JÎ LI DIMILÎ

Yew roc, yew mêrdimo extiyar bî. Namey cê Xalê Hus bî.

O, hewtês-heştês sera, yew keyneki rimneno.

Keyneki tira wana:

-Xalê Hus, ti mi benê kura?

Xalê Hus wano:

-Ez to benê, xwi rî gêna.

Keyneki tira wana:

-Ti mi gênê, feqet ez to nêgêna !


Xalê Hus wano:

-Ti wazena mi bigî, ti wazena mi megî, ez to gêna !

Mîrkûtên xwe bilind kin !

# MÎRKÛT

KOVARA HER TIŞTÎ YE JI BO HERKESÎ YE



MÎRKÛT jimare 3

15/1/1986'an de derdikeve, bipên!

HIN NIVÎS Û MEQALE JI JIMARE 3 :

- Danasîna karîkaturîstekî kurd,
- Helbestek ji Şêx Rîzayê Talebani, yek jî ji DILDAR.
- Ji edebiyata me:(ji qend roman û kovarên kurdî qend pasajên 'ecayib!)
- Fala we ya salê - Dîsa xeber û exbar.
- û şîrîr û helbest û meqale û gotarên cûr be cûr û ceribandî û deribandî.
- û dîsa nameyên. we, lê hinekî baş binivîsin!

# RICAYEK!

Mîrkut ne kovara "qerfan"e !

Kovara Federasyona Komelên Kurdistanê; Berbang di hejmara 3/85'an de, di rûpelekî xwe de Mîrkut'ê daye naskirin.

Em bi vê yekê gelek kêfxweş bûn. Gelek sipas.

Lê mixab in, Berbang bê ku lê varqile ji Mîrkutê re gotiye "kovara qerfan".

"Qerf" û "mîzah" du tiştên ji hev cihê ne.

Di kurmançî de qerf di şûna "alay etme" ya tirkî an bi zimanê xelkê "dalga geçme" de tê bi kar anîn.

Û di swêdî de jî gotina qerfê tê maneya "driva med" an "görra narr av".


Mîzah tiştêkî pîrr cihê ye.

Swêdiya wê "satir" an "humor". Ingilîzî û fransîya wê "humour" an "satire" e. Tirk jî jixwe dibêjin "mîzah".

Îcar qerf, ji sedî sed û her gav di maneyek negatîf de tê bi kar anîn. Mesela "bi yekî/tiştêkî qerf kirin an qerfê xwe kirin".

Di kultura gelê kurd de tu kes nikare bi tu kesî qerfê xwe bike; Lê em dizanin ku Berbangê vê gotinê bi niyetekî xerab bi kar neaniye. Lê dîsa jî divêt hevala ferqa di navbeyna "mîzah" û "qerf" de fam bikirana.

Em hêvîdar in, Berbang dê li vê çewtîya xwe varqile.





BIJÎ GOŞT Û BIRINC  
BIMRE NAN Û PÎVAZ!



BR 1